

TRT6 Gaveke Erênî ye

Di 01-01-2009 an de, destlata Turkiyê, bi beşdariya serokwezêr R.T. Erdogan Kenala TRT6 bi zimanê Kurdî vekir. Bilî vê jî, ji nih ve, dezgeha perwerdehiya bilind xwe ji vekirina beşên ziman û edebiyeta Kurdî re, di du zanîngehan (Enqere û Stembolê) de amade dike. Piştî vekirina kenalê, pir guftûgo li ser hatin weşandin, hin neyênî û hin jî erênî bûn. Di bawreyî me de, ku ev gava destlata Turîk, ne ji bo xatirê çavên me yê reş belek in û ne ji xwe berê hatiye, Pir sedemên wê hene.

1- Hikariya serpehatiyên Kurdan yê kevin û nû (Ubêdelah Nehrî – Şêx Seîd Pîranî- Dêrsim- Agirî PKK û h.w.d. 2- Hukariya rewşnebîrên hundir û derve. 3- Hukariya dostên Kurdan yê Tirk. 4- Hikariya dewletên Ewropa ya ji bo çareserkirina doza Kurd .5-ji bo helbijartinên perlemanto û dengên Kurd. Û H.W.D.

Bi rastî gava mirov Pîvanekê di navbera vê biryara destlata Tirk û xwîna bi hezaran şehîd û wêrankirina gundên Kurd bike, Tu carî beramberî hev netên. Û rast e jî di destûra bingehîn de, navê Kurdan nîne û nasnameya wan nehatiye pejirandin. Lê, pirs ne ew e, ka çawa xebat bête kirin ku ev kenal di xizmeta çand, ziman û pîrsa gelê Kurd e, û pexşna vê kenalê bi zimanê Kurdî berdewam be û xebat bibe ku bikev nav xalên destûra bingehîn ya dewletê. Ji ber dewleta turîk xwedî zagone û kar û xebata siyasî, di bin siya hebûna zagonek weha de, pir û pir hesan û rê

Hesenê Cumî li ber kar û xebatê vedike û hêzên siyasî karin hin armancên xwe biqopirînin û bi cî bînin. Zagona dewleta Tirk, ne weke ya destlata partiya Beis e. Sûriya ji 48 sal an ve di bin siya zagonên awerte de dijî. Lewre jî zagone dane ser refan û her dezgehê ji dezgehê dewletê , xwedî zagone serbixwe ye.

Bêguman, weke me li jor gotibû ku, ev biryar ne li gor hebûn û daxwaza gelê me yê Kurd e . Lê, gaveke li ser riya çareserkirina pîrsa Kurd di Turkiyê de ye û li dijî helwestên Kemalîzm e. Lewre jî divê em lê bibin xwedî û pêşve bidin, daku di xizmeta me Kurdan keve.

Ji weşanên nû

" Gulistana Zimên" pirtûkeke fêrbûnê ye, Kurdî- Erebî ye , ji 165 rûpelan qetê navîn, û ji sê beşan hevedudanî pêk hatiye . Beşê yekê Abeya Kurdî ye, beşê diwem rêzimanê Kurdî bi şewekî kurtkirî ye û beşê siyem jî ferhengoke, ji dora 3000 bêjeyên pir bi kar tên e.

Hêjaye em xwendevanên Newrozê agahdar bikin ku, derçûna vê pirtûkê bi erêkirina Şalyara Ragihandinê ye. Dêroka erêkirinê 20-10 û nimra wê jî 2624 e. Em bi Hêvî ne ku, sûd û kêrhatin ji vê pirtûkê were girtin û armanca mamoste Merwan Berekat ji pirtûkê bi cî were.

